Demirbaş beşdarî civîna ji bo azadiya xwe bû

Kurdocide Watch-CHAK berî niha bang li dostên Kurda û siyasetvanên Kurda ku du partiyên Swêdê de xebatê dikin kir ku, ji bo azadiya Şaredarê SUR ê Abdullah Demirbaş di 15 nîsanê li Stockholmê bicivin.

Lê berî bi civînê, evara 14 gulanê Abdullah Demirbaş serbest hatibû berdan.

Kurdocide Watch-CHAK tevayê mevanên vexwendî li ser azadibûna Demirbaş agehdar kir, lê qala paşxistin anjî pêknehatina civînê nehate kirin û civîna ”Azadî ji bo Abdullah Demirbaş” di 15 gulanê li Zanîngeha Sodertorna Stockholmê pêk hat. Di civînê de parlementer û siyasetvanên Kurd hebûn.

Civîn bi axaftina kordînatorê CHAK-Bakur Seyidxan Anter dest pê kir. Paşê Cigirê Serokê Giştî yê CHAK ê Gabar Çiyan li ser kampanya Demirbaş û azadiya wî zaniyarî pêşkêş kir. Çiyan qala sûprîzekê ji beşdarê civînê re kir û bi rêya têlê xwe gihand Abdullah Demirbaş. Abdullah Demirbaş piştî ku hate berdan cara yekê beşdarî civînekî, li ser azadiya xwe bû.

CHAK-Bakur mizgîniya kampanya xwe ya nû, ji bo azadiya zarokên Kurdan di zindanên Turkiyê û Kurdistanê, da Demirbaş. Demirbaş spasiyên xwe gihand tevayên kes û dezgehên ji bo azadiya wî xebitîn û axaftina xwe wisa domand:
”Azadiya mirovan giring e. Gelek spas ji şexis û dezgehên ji bo azadiya min xebitîn. Her wisa spas ji bo Navenda Çanda Asuriyan ku xelata xwe pêşkêşî min kirin. Ez derketim lê gelek kes di hepsê de ne. Dilê min bi wan re ye- Cihê kêfxweşiyê ye ku CHAK kampanyek nû û bi wate daye destpêkirin. Hejmarek mezin ji zarokên Kurdan di hepsê de ne. Xebata ji bo azadiya wan giring e.”

Civînê biryar da ku, kampanya ji bo azadiya Zarokên Kurda yên di zindanan de piştî amadekariyên bingehîn dest pê bike.

CHAK-Navenda Dokumentasyonê - EuroKurd News